



Author: Hakan Özoğlu

Translate: Ali Karadeniz

ISBN : 978-605-105-102-4

"Tirk û Kurd wek du xelkên hêja, wextekî dirêj e li Anatoliyayê bi hev re derbaskirine û mensûbê eynî dînî ne. Belê dîsa jî, xebatên aqademîk yên derheq Tirkîye, nexasim jî yên li Tirkîye çap bûne, heta demeke nêzîk ji ber sebebên tên zanîn, mijara Kurdan mixabin wer maye diqorzî û quncikan de. Ya rast, jibo fahmkirina dîroka Tirkîye û Osmanî, pêwîst e ku Kurd jî mîna parçekî muhîm ê vê dîrokê bêne dîtin. Ev kitêba dest we de, di çarçoveya "Xebatên Derheq Tirkîyeyê" de, li pêşdarên sereke yên Kurdan û li hereketên wan ên neteweperwer yên di sed sala 20an de derketine, ji nêz ve dinere û bi

qasî îmkanan, girêdayî çavkaniyên pêşî dimîne, di pêvajoya dîrokî de li peywendiya navbera dewleta Osmanî û Kurdan vedinere. Çawa ku di dîroka Tirkîyê de nedîtina rola Kurdan şaşîtiyek be, ew îdîya ku di seranserayî dîrokê de nasnameya Kurdî xwediyê naverokeke neguherî ye jî wer şaşîtî ye. Beşekî vê kitêbê bi temamî di heqê pêşveçûna nasnameya Kurdî maneya mefhûma Kurdî ya dîrokê pêde dewamî rûberî guherînê maye vedinere, û seba muhîmtirîna vê guherînê jî bandûra ku Kurdan ji dewletên lê jiyane stendine. Heta demên nêzîk, kitêbên li Turkiyê weşiyane yên derheq derketina neteweperweriya Kurdî de vekolîn kirine, bi pirranî aliyê wan ê îdeolojîk li pêş e. Ev jî li dijî bêterefiya aqademîk e û dibe sebeb xwendekar rast agahdar nebin. Salên dawî li pey hev derketina çavkaniyên bingehîn û li Tirkî wergerandina hin xebatên zimanê biyanî yên ku li objektîfîbûna aqademîk miqate ne, kêfa meriv tîne. Bi vê rêyê xwendekar li Tirkîyê firset û şensê wî çêdibe ku bigihîje kitêbên derheq mijareke wek neteweperweriya Kurd ku ji Tirkîye û Rojhilata Navîn re, hetta ji Ewrûpa re jî mijareke pîr girîng e. Hêvîdar im, vê kitêba dest we de, derheqê têkiliyên navbera dewleta Osmanî û pêşdarên Kurdan alî me bike ku zanînen me yên hindik firehtir bike."